

NEWROZ PÎROZ BE!

Agirê Newroz her hévîya gelên bindest û xewnerêşka Dehaq'ên zalîm e!

Tu bixêr hatî **Newroz**, roja serhildan û serfirazî! Tu bixêr hatî agirê serhildanê gelên Ereb, ku li hemberî dîktatorên paşwerû bédengîyên xwe yê bi dehan salan şikandine. **Newroz**, rojê ku neteweyê Kurd li hemberî zulmê serî xwe hilda, îro wekê meşaleyekê di destê gelên Ereb de welat bi welat té gerandin. Bi hatina meha Adar'ê bihar bi serhildanên ve té pêşwazkirin û giyana **Newroz**'ê li Rojhilata Navîn û Afrîkayê Bakûr bi véxistina agirê, bi girtina govendê, û bi zédetirkirina berxwedanê ve her ji nû ve jîndar dibe.

Ligel ku **Newroz** tê wateya roja nûhû û ku gelên Rojhilata Navîn vê rojê weke mizginiya biharê pîroz dikan, ji bo Kurdan wateyekê vê rojê kûr û dîrokî heye. Ji bo Kurdan Newroz roja serhildan, berxwedan, û biserketin e. Ji Kawayê Hesinker heta Komara Mahabat'ê, ji serhildana Dêrsim'ê heta serhildana îroyîn, neteweyê Kurd ji aliyê dewletên herêmê ve hatiye bindestkirin, çewisandin, qirkirin, û înkarkirin. Ligel wan hemû hewldanên tunekirinê, neteweyê Kurd berxwedana xwe berdewam kiriye û **Newroz**'ê kiriye sembola serfirazî û wê bi coşekê her gêştir dibe pîroz dike.

Zîhniyetê tunekirin, înkâr, û zordestî ku bi sedsalan e té sepandin, îro ji aliyê hézên ku serdestê dewleta Tirk in ve té berdewamkirin. Şahîdê vê tunekirin û inkâr îro hestiyên bi hezaran berxwedêr, ronakbîr, û şoreşgerên ku tén ji erdê derxistin e. Li her bostê axê Kurdan hestiyên mîrov hatine veşartin. Herwiha, ev polîtîkaya "vêbûn" înkârê her berdewam dike. Li dadgehê, mafa xwezayî ya xwe bi zimanê xwe yê zikmakî parastin a bi sedan siyasetmedarên Kurd ku sala par di bin operasyona KCK'ê de hatîbûn girtin té astengkirin. Hin mafên demokratîk ku Kurd di nav daxwaza "muxtariyetê demokratîk" de dixwazin bi dest bixin rastî her cûre êrîş û zordarî té û nayê pejirandin.

Hikûmkata AKP tu carekê nexwast encamên hilbijartinên dawîn én wilayetên Kurd bipejirîne. Herwiha, bi nézîkbûna hilbijartinên pêşîn jî êrîşên xwe her zédetir dike. Operasyonên li hemberî gerîlla bêrawest berdewam dikan. Daxwazên KCK'yê ku bi despêka agirbestê hatîbûn pêşkeşkirin tu carekê nakeve rojevê hikûmatê. Ligel ku di her fersendê de dijberiya xwe ya li diktatoryaya leşkerî ya 12 Rezber'ê tîne zimên, hikûmata AKP daxuyand ku ew é baraja 10 ji sedî damexe. Armanca vê biryarê jî xuya ye: astengkirina vîna neteweyê Kurd.

Lé ligel her cûre zordestî û şidetê, neteweyê Kurd her roja Newroz'ê berxwedanê xwe digêhîşîne astekê bilindtir. Ligel dewleta Tirk her daxwaza mafa demokratîk a neteweyê Kurd bi zordarî û tepeserî dibersivîne, Kurd stûnexwarkirinê xwe her berdewam dike. Li erdnigarê Rojhilata Navîn û Afrîkayê Bakûr, agirên serhildanê her mezin û belav dibin. Gelên Ereb ji bo despotên welatên xwe û neteweyê Kurd ji bo dewleta Tirk xewnerêşkbûyîné berdewam dikan.

Konfederasyona Karkerên ji Tirkîyê li Ewropa (KKTE), Newroz'ê, roja serhildan a neteweyê Kurd bi coş, biryarî, û giyanekê berxwedêr pîroz dike û îlan dike ku em é agirê ku gelên Rojhilata Navîn véxistiye û kevenêşopiya berxwedan a gelê Kurd berbihev bidin û bi wan re em é li qadan bibin.

NEWROZ ROJA SERHILANÊ JI BO GELÊN EREB HÉVÎ BIBE!

ÇEJNA NEWROZ A NETEWYÊ KURD PÎROZ BE!

BIJÎ NEWROZ, ROJA SERHILDANA NETEWE YÊ KURD!